# 1071 ŞERÊ MELEZGIRT Û ROLA KURDAN

Abdulkerim BATMAZ
Zakho Üniversitesi- İnsani Bilimler Fakültesi- Türk Dili Bölümü- Kürdistan Bölgesel Hükümeti/Irak

**Kurte:**

Dîrok zanisteke ku lêkolînê liser rabirdûyê dike da ku dema îroyîn şîrove bîke siberojan ronî bike. Dîrok ji bo jiyan, rewşên sosyo-ekonomîk, çand û tekîliyên mîrovên serdemên berê tev wext û cîh diyar bike lêkolînê pêk tîn. Di dîrokê de ti netewe tine ku paşeroja xwe arasteyî rabirdûya xwe bike.

Ji bo miletekî felaketa herî mezin ev e ku dîroka wî ji aliyê kesên din ve bê nivîsandin. Ev tespît pir watedar e û gelê Kurd eleqedar dike. Ji ber vê yekê Kurd tevî hemû zehmetiyan, dema dest bi nivîsandina dîroka xwe bikin, dikarin xwe bigihînin rastiyên berê.

Şerê Melezgirtê tevî 950 sal di ser re derbas bûye hêji dibe mijarê niqaş û polemîkên cuda. Ji hêla gelek dîroknasan ve wekî destpêka hilweşîna demdirêj aÎmparatoriya Bîzansê tê pejirandin. Ev şer di heman demê de bû sedema Seferên Xaçperestan ji. Şerê Melezgirtê hem ji bo alema Îslamê, û ji bo Ewropî hem jî, ji bo Kurd û Tirkan xwedî cihekî girîng e. Ji ber vê yekê şerê Melezgirtê di navbera dû gelên cuda an dû neteweyên cuda de derneketiye. Gotûbêja li ser hebûna Kurdan li şerê Melezgirtê li dora çend pirs û şîroveyên ku ji bersivên ku ji wan re hatine dayîn dizîvire. Gelo di şerê Melezgirtê de Kurd di nava artêşa Selçûqiyan de hebûn? Hejmara wan çend bûn? Aya beşek ji artêşa Selçûqiyan pêk dianîn? Gelo di şerê Melezgirtê de Kurd û Tirk bi hev re biser ketin? Taktîkên şer ên Siltan Alparslan û Romanos Diogenis çi ne?

Dema ku em li van hemû pirsan dinêrin, em nikarin bigihîjin belgeyên orîjînal û objektîf ên derbarê şerê Melezgirtê de. Ji bo ku sedem û encamên wî şerî baş bên fêmkirin, pêwîste serpêhatiya guherîna herêmê ya demeke dirêj were analîzkirin.

**Peyvên Sereke:** *Şerê Melezgirtê, Kurd, Siltan Alparslan, Romanos Diogenis.*

**Destpêk:**

Wek ku tê zanîn; ji bo miletek felaketa herî mezin, nivîsandina dîroka wî ya bi destê dijmina bê nivîsandin. Ew tespît pir watedar e û rastîya Kurda eleqedar dike. Ji ber wê yekê Kurd bixwe dest bavêje dîroka xwe binîvîse, bi serê xwe pir girîng e.

Şerê Melezgirtê her çend ji hêla dîroknasên Rojhilata Navîn û dîroknasên nûjen ve hindik tê zanîn jî, şer li ser gir û çiyayên Başûr û rojhilata Melezgirtê pêk hatîye. Ev şerê dîrokî li deştâ Melezgirtê li qiraxê çemê Miradê di navbera Romanos Diogenis û Siltan Alparslan çêbûye.

Bê guman di navbera Cîhana Bîzans û Cîhana Îslamê de encamên mezin derxistin holê. Ew yek ji têkiliyên dîrokî yên herî girîng e ku çêbûye. Ji ber vê yekê Şerê Melezgirtê; dîroka Bîzansî, Kurd, Tirk, Ermenî, Gurcî, Ereb, Faris, Selçûkî, Ûz, Peçeneg û Slav hwd, bala hemû dîroknas û zimannasên ku pê re eleqedar in kişandiye ser xwe.

Armanca wî şerî, ji bo Tirkan hem vekirina dergehê Anatolya bû, hem jî ji bo rawestandina Împaratorê Bîzansê bû. Her dîsa armanca sefera Romanos Diogenis ew bû da ji Melezgir û Xelatê heta Rey û Hemedanê erdên cîhana Îslamê dagîr bike. Li cebheya pêşîn jî erdên Kurda hebû. Erdên Kurda, ji yên nav dewletên Şeddadî, Rewadî û Merwaniyan de bû. Ger Împarator Romanos Diogenis bi serketaya ev her sê dewlet jî wê têketana bin desthilatdarîya Romayê.

Sala 1071'ê, salekî ku berjewendiyên dû dewletên mezin yên Rojhilata Navîn li hev ketin. Ev dewlet Împaratoriya Bîzans û Dewleta Selçûqiyan bûn. Di sala 1071'an de, Împaratorîya Bîzansê li dijî dewleta Selçûqiyan a Mezin dest bi amedekarîya şer kir. Romanos Diogenis hema hema hemî xezîneya dewletê ji bo afirandina artêşek mezin bikar anî. Her çend di çavkaniyan de hejmarên cuda li ser hejmara vê artêşê hatine dayîn jî, Dîrokzanên Îslamê yên wê demê îddîa dikin ku hejmara artêşa Romayê ji 200 hezar kesan pêk dihat. Hejmara artêşa Siltan Alparslan di navbera 14-20 hezar kesan de bû. Tê gotin ku hemî siwar bûn. Ji van, şeş hezar kes yên yekîneya taybet a Siltan bûn, yên din jî leşkerên dewleta Şeddadî, Rewadî û Merwanî û beşek ji gelên misilman ên nav van dewletan bûn (Strabo, 1993: 29).

Ji ber wê yekî lêçûnên seferê jî hat zêdekirin, diyar bû ku têkçûneke muhtemel dê derbeyeke mezin a aborî li Bîzansê bide. Di her rewşê de, armanca herî mezin ya Romanos Diogenis, ew bû ku Tirkan bi tevahî ji Anatolyayê derxîne (Strategikon, 2010: 29). Ji bo vê armancê her tişt xistiye xeterê.

Ji aliyê din ve Siltan Alparslan bal kişand ser aloziyên li Xîlafeta Fatimîyan a Misrê.Di serdema Xelîfe El-Mustensir de ji ber lawazbûna xezîneya dewletê desthilatdariyê, di navbera walî, fermandar û emîrên wezîr de şer derket. Nasırü'd-devle, piştî ku Sûdaniyên ku ji bo Dewleta Fatimîyan tehdîd bûn ji holê rakir, dema ku hêzek cidî li hember wî nemabû, çavê xwe berda xelîfetiyê. Ji bo vê yekê biryar da ku ji Siltan Alparslan ku dijminatiya wî bi Dewleta Fatimîyan re hebû alîkariyê bixwaze. (Tufantoz, 2004: 231). Weke ku tê dîtin, pêşketinên ku di sala 1071'an de bêyî ku haya wan jê hebe, van her sê dewletên mezin (Împaratoriya Bîzans û Dewleta Selçûqiyan û Fatimî) ber bi qedera xwe didan (İbn-i Adim, 1976: 380).

Xaka Kurdistanê xwedî erdnîgariyeke ku di çarçoveya xwe de bi gelek çandan re li ber xwe daye û di pêvajoya dîrokî de mazûvaniya gelek netewe, ol û dewletan kiriye. Bi rastî rûmeta gelek miletan li Kurdistanê ket nav rûmeta gelek miletan, lê rûmeta gelek miletan hat veşartin.

Mixabin di dîrokê de îro jî, li hember emperyalîstan, gelek kes alîkarîya ku Kurdan daye Tirkan û bûyerên dîrokê paşguh dike û hebûna Kurdan jî înkar dike. Ev rewş Kurdên dilsoz pir diêşîne. Me dem bi dem dît û şahidî kir; dema ku dîroknas an jî zanistek Kurd, bi hestên herî samîmî bibêje; "Kurd hene, ez Kurd im" li beramberî wî tevgerên cudaxwaz xwe dîyar dikin dibêjin "Kurd tine ne, ev Tirkên çiyayî ne". Di aslê xwe de kesên ku bi vî rengî dihizirin û li ser Kurdan serdest in armanca wan ew e ku; feraseta netewe di nav Kurdan de belav nekin û wan ji netew-dewlet dûr bixin. Tirk, miletekî ji Asyaya Navîne. Li aliyê din Kurd jî bi eslê xwe miletê Mezrabotan, ango Mezobotamya ne. Pêvajoyên Îslamiyetê yên her du gelan ji hev cuda bin jî, ya herî eşkere û hevpar taybetmendiya wan ew e ku misilman in. Di wê demê de Dewleta Ebbasîyan li alema Îslamê desthilatdar bû. Nûnertiya dewletê dikir. Lêbelê sedsalê XI. Dewleta Ebbasiyan qels bû û di erdnîgariya Îslamê de devletên bi navê Tevaif'ül-Muluk hat avakirin. Valahiya

siyasî ji Dewleta Ebbasî û qada olî bi giranî ji aliyê Bûweyîyên Şîe ve hatibû dagirtin. Dewletên Kurdan li Îran, Azerbaycan, Bakûrê Iraqê û Rojhilatê Anatolyayê serdest bû. Bûweyîyên Şîe li Îran û Iraqê bûne hêzeke siyasî ya sereke, gelek dewlet, mîrek û xanedanên Kurdan xwe we girêdabû. (Bidlîsî, 2006: 18).

Dema ku Selçûkî hatin Îranê û bi gelê Kurd re ketin têkilîyê, xanedan û waliyên Kurda li Îran û Azerbaycanê ji aliyê dînî ve girêdayî Bûweyiyên Şîe bûn. Hesneveyh, Revadî, Şeddadî û Merwanî di demê Siltan Tugrul de çend têkilîyên wan hebûn. Di dema Siltan Alparslan de, Kurd jî bi Selçûqiyan re li Şerê Melezgirtê bi Bîzansiyan re şer kirin. Di nav xanedanên Kurdan de ya herî bibandor û li Anatolyayê ava bûye, Merwanî ne. Merwanî beriya Selçûqiyan bi qasî şêst salan li Farqînê û Anatoliyê dijîyan. (Müstevfi, 1919: 34, 54, 78, 87, 100, 107).

**1.1 Kurd û Selçûkî:**

Kurd bi eslê xwe yek ji gelên xwecihîyên/otoktonên Rojhilata Navîn in. Lê mixabin agahiyên li ser Kurdan wek; dîrok, erdnîgarî, pêkhateya etnîkî û çandî kêm in. Rastiya hin agahiyên derbarê Kurdan de cihê nakokiyê ye. (Bidlîsî, 2006: 32).

Erdnîgar û nivîskarên Îslamî, di berhemên xwe yên li ser Kurdan de nivîsîne û agahî dane û xebat kirine ew in: Ebdullah b. Hurdezbih, Vazih El-Yaqubî, Omer Ibn Rusteh, Ibn Fakih el-Hemedanî, Huseyin el-Mesûdî, Îstehrî el-Farisî, Elî Îbnî Hevkel, Ehmed el-Mukeddesî, Mihemed El-Bekrî, Îdrîs el-Îdrîsî, Yakût el-Hemewî, Zekeriya Kazwînî û Îbnî Se'd el-Mexrîbî. (Ezrak, 1990: 73, 74).

Nivîskarên dîroka Îslamî ku di berhemên xwede li ser Kurdan xwedî agahî û pirtûkên wan hene ji ev in: Dîroka Tabarî Belazûrî, Fütûh ül-Büldan û Ensâb ve'l-Eşraf, Ebû Henîfe Dineverî, Ehbar el-Tîval, Îmam Zehebî, Tarih'il-Îslam, Câhiz, Kitab'et-Tajfî Ehlak el-Muluk, Îbn-î Miskeveyh, Tecarib'el-Ümem, İbnü'l-Ezrak, Dîroka Amed û Meyyafarqin, Îbnû'l- Esîr, el-Kamil, fit-Dîrok, Hafiz Îsfehanî, Ehbar-î İsfehan, Mutehhar Tahir el-Makdîsî, el- Bed-i ve't Tarih, İbn-i Kathir, el-Bidaye ven-Nihâye, Kemâleddin İbn-i Adim, Buğye et-Taleb fî Dîroka Haleb û İbn-i Xaldun dîroka wî Îbnî Xeldûn Muqaddîme. (Esîr, 1987: 36, 65. Miskeveyh, 1916: 106).

Di serdema Dewleta Ebbasîyan de Tirk û Kurdên misilman bi hev re dijiyan. Kurd li herêmên gundewarî yên bajaran dijîyan û cotkarî dikirin. Tirk di dewleta Ebasiyan de bûne leşker û cerdevanên artêşa xîlafetêbûn. Kurdan dema ku li dijî Dewleta Ebbasîya serî hildan, fermandarên Tirk carinan serhildana Kurdan ditepisandin. Wek mînak serhildana Kurdan ya Cibal û Faris, Vasıf el-Turki tepisand. (Esîr, 1987: 1218). Di navbera her dû miletan de dem bi dem hin pirsgirêk derketin. Dewleta Ebbasî gelek caran ketîye nevbera şerrê van her dû gelan.

Kurd beriya ku bi Selçûqiyan re rû bi rû bibin, di dewleta Xeznewî de leşker bûn. Mehmûdê Xeznî hêza leşkerî ya Kurdan li dijî Qerexaniyan (Karahanlı) bikar anî bû. Artêşa Xeznewî ya ku li dijî Selçûqiyan şer dikir, ji siwarên Kurd û Ereb pêk dihat. (Beyhâkî, 1982: 663, 664). Di nava artêşa dewleta Xeznewî de Kurd, Ereb, Faris û Daylemî hebûn. Artêşa Xeznewî ji Tirk, Sîstanî, Hîndû, Tacîk, Kurd û Ereb an pêk dihat. (Grigorevich, 2006: 69).

Dema ku Oxûzên pêşengên Selçûqiyan hatin bajarê Reyê, Waliyê Xeznewiyan Taş Ferraş bi 3000 siwarên ku Kurd jî di navde bûn, wan pêşwazî kir. (Köymen, 1993: 65).

Artêşa Selçûqiyan jî ji neteweyên curbicûr pêk dihat. Bingeha artêşê, Tirk û endamên eşîra Tirkmenan bûn. Paşê Kurd, Ereb, Ermen, Daylam, Faris û miletên din

hebûn. Tirkan û Tirkmenan hêmana sereke ya artêşê bûn, piştre hêza Artêşê Kurd û Memlûkîyan pêk dihat. (Sallabî, 2007: 349).

Dewleta Ebbasî dewletekî konfederal bû ku ji emîrîyên cuda yên ku li gor qanûnên Îslamî li hemberî hev xwedan maf û berpirsiyarî bûn pêk dihat. Her dewletekê (emîrîyekê) li ser navê xelîfe û siltanê ku wî ew naskiribû xutbe dida xwendin, baca siltan û xelîfe cuda cuda dida û esker dişand şer. (Ezrak, 1992: 112). Di destpêkê de Xelîfeyê Ebbasî hem serokê dînî hem jî yê serokê sîyasî yê alema Îslamê bû. Emîriyên Îslamê (dewletên misilman) jî ew nas dikirin. Lê piştî Xelîfe Harûn Reşîd, li navendê şerên dijayetiyên navxweyîn û reqabetê(minafeseyê) desthilatê destpêkir, ji sedsalên 9-10a û pê ve desthilatên dînî û sîyasî ji hev cûda bûn. (Esîr, 1987: 1218).

Xanedaniya Bûweyîyan li Bexdayê desthilata sîyasî bi dest xist. Li cîhana Îslamê di xutbeyan de ji bilî navê xelîfe, navê serokê Bûweyîyan jî hat xwendin. Kî li Bexdayê desthilatdar bûya xelîfeyan digot navê wî di xutbeyan de hildin, bacê û esker bidin wî. Wek dewletên din yên misilman dewletên Kurdan jî ev dikirin. (Mercîl, 1992: 415).

Ji destpêka sedsala 11a û we Oxuzî/Selçûqî ji Asyaya Navîn ji Xorasanê, ber bi Buweyîyan hatin dest bi şerê li ser desthilata Bexdayê kirin. Xelîfe ji desthilata Buweyîyên şîe yên ser Bexdayê tengav bibû, piştgiriya Tuxrul Begê Selçûqî yê Sunne kir. Di encamê de Tuxrul Buweyî şikandin û bû desthilatdarê sîyasî yê Bexdayê. (Ezrak, 1992: 146).

Piraniya Selçûqiyan û Oxûzîyan li Maveraünnehirê çûn cem Îbrahîm Yinal, li ser vê yekê Îbrahîm Yinal ji wan re got: ‘‘Hûn li vir bimînin û Welatê min ji di tengasiyê de ye, ji ber ku hûn li vir pêdiviyên xwe pêk tînin. Ji bo min tişta ku hûn dikarin bikin ew e ku hûn biçin li dijî Yewnaniyan (Rûm) şer bikin û di rêya Xwedê de cîhadê bikin.

Ji ber vê yekê hûn dê ganîmet bistînin, di karên ku hûn ê bikin de ez dê li ser şopa we bim, ez ê alîkariya we bikim.’’ (Esîr, 1987: 415). Oxûzîyan vê pêşniyarêyê qebûl kirin û bi rê ketin. Îbrahim Yinal biqasî ku Misilman wek hedef nîşan neda bû jî, Oxûzan misilman ji kirin hedef. Oxûzîyan berê êrîşên xwe dan rojhilat û li ser Îranê re xwe gihandin Azerbaycanê. Mîrê Azerbaycanê Vehsûzan bi Oxûziyan re bû alîkar û bi wan re xizimtî kir. Lê belê Oxûzên bi pêşengiya Toros, Goktaş û Mansûr li herêmê di sala 1037-1038’an de ketin naw bajêr, mizgeft şewitandin û gel qetil kirin, gelek kes kuştin. Her wiha gelek ji Kurdên Hezbaniyê jî hatin kuştin. Pirsgirêk û tevlihevî zêde bû. Kurd û xelkê bajêr dema felaketa ku hatiye serê wan dîtin, xwestin pêşî li xerabiyên Oxûzîyan bigirin. Ji bo aştî û tifaqê hewl dan. Li herêmê li dijî Oxûziyan tifaqek hat avakirin. Li ser vê yekê Oxûzî bûn dû parçe û ji herêmê derketin. Ê derketin pişt xwe re bajarê Hemedan û Rey şewitandin û talan kirin.(Gregory, 1999: 295).

Di sala 1041’ê de Oxûz dest bi dagirkirina ser axa Kurda kirin. Nasruddewle Ahmet li ser komkujî û qetlîamên ku ji aliyê Oxûzan ve hate kirin bi nameyek ji Siltan Tûxrûl re nivîsand. Nasruddewle li Diyarbekrê Emîrê dewleta Merwanîyan bû. Siltan Tûxrûl bersiva nameyê da û jê re got: ’’Min bihîstiye ku leşkerê min hatine bajarê we. Dilfireh tû emîrekî dewleta xwe yî; mal û milk bide leşkerê min, pereyên bide wan û li hember kafiran (Bîzansiyan) divê hûn ji alîkarî leşkerên min werbigirin. Ji ber ku armanca wan axa Ermeniyan e.’’ (Turan, 2012: 113). Emîrê dewleta Merwanîyan Nasruddewle ev yek qebûl nekir. Di sala 1043’an de Tûxrûl Beg di bin fermandariya du fermandaran xwe de 10 hezar leşker bi siwaran pêk dihat, şand Diyarbekir û wek mîrîtî da wan her dû fermandarên xwe. Fermandarên bi navê Boxa û Anasioxlu êrîşê gelên li vir kirin û

Dîyarbekîr talan kiri duran berê xwe dan Farqînê. Li ser vê yekê deriyên bajêr hate girtin û di navbera her dû aliyan de lihevhatin çêbû.

Emîrê dewleta Merwanîyan Nasruddevle ji wan re 50 hezar zêr pêşkêş kir û ji wan xwest ku ji axa wî derkevin, lê ew wî çendî qebûl ne kirin. Paşê di navbera emîr û her dû fermandaran de şer derket. Li ser vê yekê, Nasruddevle êrîşî wan kir, gelek kes kuştin, hinek ji wan girtin û her tiştê wan wek xenîmet dest xistin. (Ezrak, 1992: 152, 153).

Ji sala 1043'an Îbrahîm Yinal, bi leşkerê xwe we, heta Hemedan û Îsfexanê û di nav sê salan de heta beravên Dîcleyê warê Kurdan bi dest xistin. Paşê Yinal, herêma Geylan bindest kir. Paşê derbasî çemê Arasê bû, kete Arran, Gurcistan û Ermenîstanê, bi wî rengî beşek mezin ji herêma Kurdan ketibû destê Selçûqiyan. (Sevgen, 1982: 17).

Ji aliyekî ve Selçûqiyan erdnîgariya Îslamê xistin bin desthilatdariya xwe. Ji aliyê din ve li hemberî Xiristiyanan Kafkasya û Anatolya jî dagir kirin. Serkeftina herî girîng a Selçûqiyan li hember Bîzansê di serkeftina Şerê Pasinê bû. Piştî serkeftina Hesen Kalê (Pasin 18 Îlon 1048), Împaratorê Bîzansê Kostantinosê IX. bi rêya Merwanîyan ji Siltan Tuxrul daxwazê aşîtîyê kir. Piştî serkeftinê Împeratorê Bîzansê, Siltan Tuxrul bi dû qasidan re diyariyên hêja şandin. Qasid li cem Merwanîyan sekinîn, lê ji ber ku Merwanî bi Selçûqiyan re nav têkoşîneke de bûn, Qasid diyariyên wan li cem xwe hişt û ewlehiya rêyan ji xwe re gerîya. (Cevzî, 2011: 35).

Dîroknasê Tirk Osman Turan dibêje ku, navbera Selçûqî û Împaratoriya Bîzansê bi rêya Emîrê Merwanî Nasruddevle li Diyarbekirê, bingeha însiyatîfa aşîtiyê ava kir. Tuxrul Beg daxwaza wi aşîtîyê qebûl kir. Qasidê Bîzans G. Dross, li gel zelamê Nesruddevle, Şêx el-Îslam Ebû Ebdullah b. Merwan re çû paytexta Selçûqîyan, diyariyên bi nirx û nirxek nedîtî împarator ji siltan re şand. (Turan, 2012: 124).

Di sala 1048'an de têkiliyên navbera eşîrên Hemîdî û Hîzbaniyan xirab dibin. Siltan Tuxrul di sala 1049'an de ji Melîk Nasruddevle Ehmed xwest ku bi navê Siltan Tuxrul xutbeyên înê bixwîne û li seranserê welêt belav bike. Melîk Nasruddevle ev daxwaz qebûl kir û fermana bicihanîna daxwazê da. Piştî vê bûyerê, dû têkiliyên baş di navbera her dû dewletan de çêbû. Nasruddewle Ehmed ji bo piştgiriya Siltan leşker şand û Siltan jî gelek diyariyên hêja dan Melîk Nasruddevle Ehmed. (Zekî Beg, 2011: 500).

Tuxrul Beg di sala 1054-1055 de çû Azerbaycanê û Tebrîzê. Li wir ji Mîrê bajêr Ebû Mensûr Vehsuzan b. Mihemed er-Rewadî li ser navê Tuxrul Beg xutbeyek da û ji bo razîbûna wî diyarî şand. Tuxrul Beg rêveberiya herêmê da wî. Dûre Tuxrul Beg berê xwe da Melezgirt, ew der bin hekîmîyeta Romayiyan bû. Bajar dorpeç kir û gel di rewşeke dijwar de hîşt, li derdora bajar talan û wêran kir. Melezgirt bajarekî qelebalix bû. Di vê navberê de li Amedê Melîk Nasruddevle b. Mervan gelek diyarî û leşker da Tuxrul Beg. Nasruddevle ber serê xwe li ber Tuxrul Beg tewandibû û li ser navê wî xutbe dabû xwendin. (Gregory, 1999: 304).

Di destpêka sala 1054'an de Tuxrul Beg çû Tebrîzê. Ji xanedana Rewadî Emîrê Kurd Ebû Mensûr Vahsûdan Şadadî ên ku li Genceyê desthilatdar bûn wan îtaeta bi şertê dayîna bacên salane yên Abdulesvar qebûl kir. Emîrê Merwanî Nasruddevle jî bi alikariya leşker û kelûpelan beşdarî Şerê Melezgirtê bû. (Turan, 2012: 126).Di sala 1055an de Tuxrul Beg dikeve Bexdayê û parastina xîlafeta Îslamiyet û Ebbasiyan dike. Ev rewş bû sedem ku xurtbûna Selçûqîyan ya siyasî û olî û qada serweriya xwe li cîhanê berfireh kir. (Xeldûn, 1971: 491).

Bûweyîyê Şîe, piştgiriya leşkerî ya herî girîng ji KIurdan digirt. Selçûqiyan dema ku bi Buweyîyê Şîa re dest bi têkoşînê kirin, bi Merwaniyan re bûn dijmin. Melîk Nasruddevle Ehmed gûh neda Selçûqîyan û alîkariya Bûveyîyên Şîe kir. Bûweyîyê Şîe dema wî şerî wenda kir Siltan Tuxrul û Merwanî bûn dijminên hev. Ji ber vê yekê, Siltan Tuxrul, tevî her tiştî wekî tedbîr hate herêmên axa Diyarbekirê yên di bin desthilatdariya Merwanî yan de, navenda leşkerî ava kirin (17-18 Tebax 1057). (Cevzî, 2011: 26, 33).
Melîk Nasruddevle Ehmed dema ku di şerê Selçûqiyan û Bûveyîyên Şîe de bi ser ne ketin, diyariyên giranbiha ji xanima Tuxrul, Xatûn Siltan re şand û alîkarî ji Xatun Siltan xwest ku zirarê nebîne û jê re got: “Ez û hemwelatiyên xwe ditirsin. Min ji tirsa piştgirî da Bûveyên Şîe. Ez kalekî heftê salî me. Tu mebest û armanceke min a din nîne ji bilî parastina bajarê xwe.’’ Xatun ev xeber pêşkêşî Siltan kir. Li ser vê yekê Siltan ji jina xwe Hatûn re got: “Wî du qaside min xistine zindanê, alîkariya dijminên me kir. Ez ji nêz ve fêr bûm ku li der û dora leşkeran kom dikin û li hemberî me tedbîran digirin. Bi rastî hemû kirinên wî sûcekî ku nayê efûkirin e’’ (Cevzî, 2011: 36).

Meraq dikim ev gotin çiqas rast in, we ji kîjan bûyerên dîrokî tiştekî wiha bihîstiye? Lê mixabin dema ku qala Kurdan tê kirin, li ser her tiştî neheqî tê kirin û dikarin derewan jî bikin. Her wiha gelek dîroknasên Tirk dema Şerê Melezgirtê dinivîsin qet behsa Kurda nakin. Heger yekî li ser Kurdan tiştek binivîse jî bi wî şiklî hewcedariya jina Siltan dikin û bêqîmet nîşan didin.
Beşek ji hêzên Selçûqiyan berê xwe dan Farqînê û bajar talan kirin. Merwaniyan qasidê taybet ji Îbrahîm Yinal re şand û jê alîkarî xwest. Di vê navberê de bîst leşkerên Oxûzîyan kete Farqînê keşîşxaneya Nasranîya ku çar sed keşîş li têde bûn û sed û bîstê wan keşîşan kuştin. Paşê yên ku sax mabûn, bi berdêla zêr û zîv ve hatin berdan. Merwanîyan sefîr şandin ba Siltan, lê Siltan heqaret li wan sefîran kir. Piştre Merwaniyan 100 hezar dînar şandin. Siltan jî bi wî re aşîtî qebul kir. Siltan Tûxrûl ji ber alîkariya Merwanîyan a ji bûna Bûveyîyên Şîe re bajar di bin kontrol û çavdêriyeke tund de hişt. (Cevzî, 2011: 37, 38, 39). Şeref Xan û dîroknasên Bîzansî ji dîroknasên Tirkan cuda li têkiliyên Selçûqiyan û Merwanîyan dinêre. Ew îdia dikin ku Merwanî bi dilxwazî bi Selçûqiyan ve hatine girêdan. Melîk Nasruddevle Ehmed qasidek şand ba Siltan Tuxrul û îtaet û dilsoziya xwe jê re pêşkêş kir. (Gregory, 1999: 310).

Di sala 1060’î de Emîrê Farqînê û Diyarbekirê, Ehmed b. Merwan Ebû Nasr El-Kurdî di heştê saliya xwe de wefat kirî. Nasruddevle Ehmed, pêncî û dû sal fermandariya Merwaniyan kir. Di dema xwe de tû kes bi qasî miletê wî dewlemend nebû û tû hukimdar wek wî temendirej nejiyabû. Herêma ku lê serdest bû bibû navenda zanist, çand û bazirganiyê. (Bidlîsî, 2006: 35).

Di serdema Tuxrul û Çaxrî Beg de avakirina Dewleta Selçûqiyan hate temam kirin û siltanîya dewletê bi Siltan Alparslan re dest pê kir. Siltan welatê xwe ji alîyên siyasî we aram kir û paşê artêşa xwe xurt kir. Piranî leşkerên Artêşa Siltan Alparslan ji Memlûkan pêk dihat. Leşkerên artêşê ji profesyonelên yên Tirk, Kurd, Îranî, Ereb, Ermenî û gelên din pêk dihat. (Zekî Beg, 2011: 506).

Thomas Ripper ku ji Mîrhond çavkanî girtiye hin zanyariyan parve dike. Li gor vê Alparslan bi artêşa xwe re meyhên Hezîran-Tîrmehê sala 1066’an de ber bi Nîşabûrê ve diçe. Di nav wan de Emîrê Merwanî û gelek kesên ji qesra wî jî hebûn ku meha Remezanê bi siltan re derbas bikin. Di destpêka meha Şewalê de Siltan berîya Cejna Remezanê 12

hezar mîr û kesayetên din ên berpirsiyarên welatê xwe wergirtin. Siltan serweteke mezin diyarî wan kesan kir. (Grigorevich, 2006: 172).

**1.2 Serdema Siltan Alparslan (1063-1072):**

Alparslan ku navê wî Muhammed bin Davud Çaxrî ye, Siltanê dûyemîn ê Dewleta Mezin a Selçûqiyan e. Serfermandar û mîrekî leşkerî ye ku arasteyî hatina Tirkan ji Asya Navîn bo Kurdistanê kir. Damezrînerên dewleta Selçûqiyan a Mezin, Kurê waliyê Xorasanê Çaxrî Beg, û biraziyê Siltanê Selçûqî Tuxrul Beg e.(Ripper, 2012: 236, 237). Di dema damezrandina dewletê de di nav şert û mercên dijwar de mezin bû. Di destpêka xortaniya xwe de bi serkeftinên xwe yên di şerên wek Dandanakan de, ku bi yekîneya hevalên xwe re tevlî bûye, bal kişandiye ser xwe û piştî mirina bavê xwe, bûye Walîyê Xorasanê. (Turan, R. 2012: 115).

Dema ku Tuxrul Beg mir, li dewleta Selçûqiyan ji bo rûniştina li ser textê siltaniyê pevçûnan dest pê kir. Kurê Tuxrul Beg tunebû, wasîyet kir ku ji kurên Çaxrî Beg Silêman biçe ser text. Wezîrê Selçûqiyan Amîd'û'l- Mulk ev wesiyet bi cîh anî û Silêman li bajarê Reyê kir siltan. Lê kurê Çaxrî Beg, Alparslan tevî hin emîr û mîrên xwe siltantîya Silêman nas nekir. (Merçîl, 2011:37). Li bajarê Qezwînê li ser navê Alparslan xutbe hat xwendin. Alparslan li ser navê Selçûqiyan li bajarê Reyê hat ser text.

Alparslan di sala 1068'an de ji bo sefera Kafkasyayê ket rê. Li kêleka wî Nizamulmulk û her wiha fetihkarê navdar Sav Tekin jî hebû. Siltan piştî hewldaneke dûr û dirêj Kafkasya zeft girt. Wî bajarên Tiblîs û Rûstov dane îdareya Fadlûn û li wir mîrektiyeke sînorî ava kir. Çendek şûnde Fadlun gûh neda Siltan û li hember wî serî hilda. Piştî serkeftina Melezgirtê, Nizamulmulk çû ser Fadlun, ew dîl girt û anî cem Siltan. (Aksarayî, 2000: 12).

Siltan Alpaslan sefera xwe ya yekem li ser Gurcistanê û Bakûrê Kurdistanê re kir. Di vê seferê de kurê wî Melîkşah û wezîrê wî Nizamulmulk jî amade bûn. Ber bi herêmên Qers û Anî yên ku di destê Bîzansê de bûn, bi pêş ve çûn û ev herêm wergirtin. Di encama wê fethê de Xelîfeyê Ebbasiyan nasnavê "Ebû-Feth" ango "Bavê fethan" da Alparslan. (Merçîl, 2011: 98).

Alparslan ji bo hilweşandina Dewleta Fatimiyan û desteserkirina Misirê seferek saz kir û ewil kete nav axa Bîzansiyan. Her çiqas di sala 1071'an de Rihayê ku di bin desthilatdariya Bîzansiyan de bû dorpêç kir jî, lê bi serneket.Cara din Alparslan ji Rihayê heta Helebê dorpêç kir, dû ramifteyên van bajêran wergirt. Alparslan ku ber bi Şamê ve diçû, xeber jê re hat ku Împaratorê Bîzansê Romanos Diogenis ji bo ser Îranê seferê ra artêşeke mezin kom kiriye û ji ber wî çendê Siltan Alparslan bi lez vegeriya. ( Belgeya Mateosê ji Rihayê, 2000: 119, 120).

**1.3 Serdema Romanos Diogenes (1068-1072):**

Dîrok û cihê jidayikbûna wî jî ne diyar e. Di 4ê Tebaxa 1072'an de li Girava Protî (Kinaliada) mir. Bavê wî, Konstantîn Diyojen, mîrekî Kapadokya bû. Diya wî jî xwişka Qeyser Romanos Argyros III. bû.

Romanos Diogenes Triaditza (Sofya) waliyê leşkerî bû, sala 1067'an de piştî mirina Konstantîna X.em de ew li Hadrianopolis (Edirne) ji ber serhildana ku wî di demek kurt de hate girtin û birin Konstantînopolê (Stenbolê). (Enstîtuya Zanistên Civakî ya Zanîngehê, Beşa Dîrokê 'Dîroka Serdema Navîn', Teza Masterê, 2016: 109.110).

Emperîsya Evdokia di yekê Çileya 1068'an de bi Romanos Diogenes re dizewice û di wê baweriyê de ye ku dikare valahiya îdarî û leşkerî ya li welêt dagire. Romanosa IV. di destpêka salên 1070'an de bêyî ku tu destkeftiyên berbiçav ji kampanya xwe ya li dijî Misilmanan bi dest bixe, vegeriya Konstantînopolîsê. Meha Adara 1068'an de êrişên xwe yên li Anatolyayê û Kurdistanê zêde kir, ji bo ku serkeftinên leşkerî bi dest bixe da ku pozîsyona xwe li hember dijberên xwe xurt bike. Di bihara sala 1071'ê de li dijî Selçûqiya (Kurd, Tirk, Ermenî, Gurcî, Ereb, Faris), dest bi tevgera xwe ya dawî kir. Diogenes Romanosê ku di 26'ê Tebaxa 1071'an de di Şerê mezin ê Melezgirtê de bi dijwarî têk çû û dîl hat girtin, bi Alparslan re peymana dostanî çêkir û piştî hefteyekê hat berdan. (Attaleiates, 2010: 185).

Li ser xebera têkçûna Bîzansê birayê Konstantinosa X., Loannes; Emperîsya Evdokia ji qesrê derxist û kurê wê Mikhaela VII. kir împarator.

Romanosê IV. yê ku bi hêzên ku berhev kiribûn Amesia (Amasya) kiribû baregeh, di şerê Dokeryayê (Tokatê) de têk çû û xwe spart Kela Edeneyê, lê di havîna 1072'an de ji aliyê artêşeke din a Bîzansê ve hat şikandin û hat girtin. Di 29'ê Hezîrana 1072'an de bi mîlekî di çavên wî dan û wî şandin Girava Protî (Kinaliada) ya Kûtahyayê. Li wir ji ber birînên xwe jiyana xwe ji dest da.

**1.4 Nameya Ku Împerator Romanos Diogenes Ji Siltan Alparslan Re Şandiye:**

Siltan Alparslan piştî çareserkirina pirsgirêka Helebê, berê xwe da Misrê, dema ku wî amadekariyên sefera Misrê dikir, Nameya Împeratorê Bîzansê hat, di nameya Împarator de nivîsîbû ku ; Artêşa Bîzansê li ser Erzerom de diçe, Xelatê dixwast ku Alparslan ji herêmên Melezgirt, Ercîş, Xelat û Menbiç derxîne. (Mîrhand, 2018: 90,91). Wekî din diyar kir ku ew ê bi artêşa xwe êrîş bike. Alparslan li ser vê peyama Qeyser û yekcar hêrs bû ji bo rawestandina artêşa Bîzansê, dev ji sefera xwe ya Misirê berdide û diçe Anatoliya Rojhilat, ango Bakûrê Kurdistanê. Di vegerê de Siltan Alparslan Ji bo fetihên li herêma Sûriyeyê qut nebin, û şer neyên sekinandin beşek leşkerê xwe li herêma Helebê hişt û yekser vegeriya. Di vê navberê de, ji Nîzamulmulk dixwest ku ew bi xwezaya xwe here Tebrîzê. (Kafesoglu, 1989: 526,530). Wekî ku di hin dîroknas dibêjin dema vegerê de hin leşkerên wî nekarîbûn bigihîje artêşê di rê de hatin veqetandin. Heta Siltan Alparslan dema ku di çemê Firatê re derbas dibe, tê gotin ku di kerwanê wî de gelek hesp, deve û hêstirên bar hilgirtî telef bûn. Siltan Alparslan ne tenê ji bo parastina Dewleta Selçûqiyan, ji bo parastina dewletên Îslamî jî diviyabû pir bi lez bimeşiya. Bi rastî, li vir tiştek din a balkêş heye. Dem ji bo Siltan Alparslan pir girîng bû, çûyîna wî ya ji bo Misrê bû sedema şikestina artêşa Bîzansê li Rojhilatê Anatolîyê (Bakûrê Kurdistanê). (Hûseynî, 1999: 30).

**1.5 Şerê Melezgirtê (26 Tebax 1071):**

Li gorî dîroknasan, Siltan Alparslan bi tevahî artêşekî ku ji dora 13-15 hezar leşker pêk hatiye çûye heremê Rojhilatê Anatolîyê (Bakûrê Kurdistanê). Tevî leşkerên ji parêzgehên derdorê ev hejmar derket 50 heta 60 hezarî. (Kazvînî, 2015: 35). Gelo ev leşkerên parêzgehên derdor kîne? Dewletên; Şeddadî, Rewadî û Merwaniyan wî demî ma tenê temaşe dikirin? Wan di nav wî şerê de cih ne negirtin?

Weke ku tê dîtin Sultan Alparslan rasterast bandorê li qedera wê herêmê bike ji bona şerê mezin bê amadehî bû. (Turan, R. 2012: 127, 134). Heta wezîrê wî Nizamulmulk

jî li ser vê meselê yek ji van hevokan di pirtûka xwe ya bi navê "Siyasetname" de wiha nivîsiye:

